
Ziman Derya ye, Masî Dimire, Derya Dimîne.



Omer Dewran

Da mirovên civakê bikaribin hizrên xwe, mebesta xwe û wateya tiştan rabigehînin yek û du, pêwistî bi navgîneka giring heye. Ji bo mirov bîr û hizra ku di hiş û mêjî de kom bûye, biherikîne der û dora xwe û ji hev sûdê werbigre, emrazê ragehandinê ya gelek giringe. Ev emraz zimane. Mirov bi rêka vê navgînê, armancê xwe, ew bîr û hizra ku serê wî rapêçaye û nehîni maye, aşkere dike û dîghîne

dewrûbera xwe û her wiha bîr û ramanên xwe belav dike. Bêyî ragîhandina raman û bîr, serkeftin û têgihîştina civakê ne gengaze. Ew ramana ku di serî de nexuyayê û ne diyare, da kesên din jî bizanibin û bîra xwe bigehîne civaka din, bê guman rol û erkê ziman nîrxekî bê gengeşeye. Raman bi akama çalakiyan ve kom dibe, bi riya ziman ve form û rûmetekî werdigre. Ziman, di ragîhandina nav civakê de, awêneya raman û hestên kesane û ji bo

nasyariya siruşt û civakê, xwedî bandoreka mezine.

Gelo ziman li cem ajelan jî heye? Dema mirov hindekî pişkîna ajelan dike, baş diyar dibe, zimanê wan jî wek yê mirovan heye û dihê guhertin. Lê ajal, weke mirovan bi sîstematîkî nikarin şêwazekî bidin dengê xwe û li dûv pîverekî, xwe binasînin. Ango ji bilî me çi ajelek nine, zimanê ku li gorî rênasîna peyvên peyda bûye, bikarbîne û xwe rêk û pêk bike. Di vê derê de wate ne ewe ku zimanê ajelan nîne? Belê zimanê ajelan heye, lê, bi tenê goşte, ew ne xwediyê wan organane ku dengê xwe, bîr û hizrên xwe sîstematîze bikin. Ev tenê karê me mirovane.

Descartes dibêje: "Mirovek her çend ji hiş kêr be jî, ew dikare peyvên xwe bi şêwazekî têgihîştî bi lêv bike. Lê, ajal çend xurt bihête xwedîkirin jî, çend bihête perwerdekirin jî, neşêt serbikeve û biaxife." Descartes bi vî rengî li dûv axaftina xwe diçe û dibêje: "Organên wan yê kirç û kal ne egera vê çendê ye, nexêr! Ji ber ku li gel ajelan, tiştê ku nîne û dibe egera lalbûna wan, hişe, hiş jî li cem wan nîne." Ziman, di leş de berejenga hizire, ew hizra ku di nava serî de veşartîye, aşkire dike.

Di nava zîndaweran de yê ku tenê dikare bi regezê xwe re bide û bistîne û xwe rabigehîne, mirove. Jîndarên dîtir jî, bi hindek berejeng û lebatan ve dikarin ji hev û du serwext bibin. Mîhek bi dengê "mee" ve gazî berxika xwe dike. Bizin, dema ji refê xwe vediqete bi dengê "mike mike" ve gazî û hawara xwe ji refdarê xwe re dişîne. Dema kûçik bi dengekî direwe, kûçikên din jî heman demê bersîva wî didin. Ev dengên

ajelan, ji zimanê mirovan hêsantirin. Di heman demê de mirov jî gelek caran li şûna ziman, hindek berejeng û bizavan bi kar dihîne. Wekî bi rakirina yek destî ve, bi wateya "raweste" Bi hejandina serî ve, bersîva "erê" an jî "na" dide. Li hember êşeke giran, ew dengê "ax û wax" wateya tiştêkî dide mirovên pêşber.

Ji bo pêşketina zimanekî, çêdibe ku gotina "were" ne pir giring be. Çêdibe ku ev gotine bi "hîrînîya" hespê ve di heman wateyê de be jî. Hesp û hîr hîra hespê ji bo me nabe bersîvek ya diyar. Lê, dema mirov li hember tiştêkî got "were" sedem û encama vê kiryar û bûyerê, bi rêka ziman ve dihête wênekirin. Bi ziman, mirov dikare egera tiştêkî xuya bike. Mirov, ajeleke, lê ajelekî xwedan axaftine û dikare dengê xwe saz bike. Ew bikaranîna ziman ve diyar dike ku ji zîndewarên dîtir rasertir û sexttîre. Bi navgîna ziman ve dikarin hemû tiştan binasînin û li ser wan daxbar bin.

Di civakê de hevkarî, azmun, zanyarî, xwe danasîn û htd. giştî bi riya ziman ve xwe digehîne armançekî.

Çi zanistek nîne ku bêyî ziman bikaribe xwe binasîne û şîrove bike. Ziman hemû zanistan digre nava xwe, dibe kaniyek ji bo encama lêgerîn û lêkolîna wê zanistê.

Zimanê ku zarok pê diaxife û pê çavên xwe vedike bo jiyane, pê şîr dimije, zimanê zikmakiye. Ango, zimanê dayîkê ye. Ziman, merc û faktorek serekiye ji bo hebûna mirovatîyê û domandina nîfşên mirovatîyê. Zimanê ku cara yekem pê "yadê", "yabo" dibêje û bi seretayî pê digrî û dikene, giringtirîn hîme di ferheng û çanda mirovan de. Ev ziman di felsefe û rewîştên mirovatîya

pêşverû de, mafê jiyaniye. Ji destwergirtin û ji navbirina ziman, pîşelkirina maf û xîreta mirovatîyê ye. Wate, ez te nas nakim, tu ne mirovî.

Ziman, nasname û dewlemendiya gele. Li hember zimanê gelan, desthelatdarên cihanê şeweyên dirindeyî û nehîni dirust kirine. Kolonyalizm, ji ber ferehkirina bazirganiya xwe, ziman, li beramberî armancên xwe weke kelem û berbendekê dibîne. Evro cîhana me ber bi gulobalîzmê ve diçe, gelek welat hene zimanê xwe yê resen ji bîr kirine, an jî naxifin. Gava Efrîqa dihê bîra me, lertz û tirsek dikeve nava dilê mirovên welatperwer û humunist.

MALBATA ZIMANAN

Li cîhanê, şeş milyar mirov, ji sê hezarî bêhtir zimanên cûrewcûr diaxifin. Lê, jimara cîhanê ji nivî pirtir tenê bi pazdeh – bist zimanan bi kar dihînin. Li cîhanê zimanê ku pirtir mirov (bi jimara pir) diaxife, li komara Çînê zimanê MANDARÎN e.

Zimanê ku evro hene û dihê axaftin, gelek xalên xwe nêzikî hev in. Her ziman çendî di nav xwe de reseniya xwe hebe jî, ew çend jî, nêzikî hev û du ne û ji hev û du bi karîger in. Her ziman dibe ku ji hev ne cuda û cewazbin. Zanyarên ku di vê mijarê de hindek tişt vekolandinê dibêjin: "Ev zimanane, zêdebarî wekî malbatekîne, zarok, nevî û xizmên hev in."

Ev zimanên ku ji famîleyekîne, destnîşana jiyana komînal ya gelan e.

Ango; zimanek dikare çavkaniya xwe ji zimanekî din werbigre û bi awayekî serbixwe pêş bikeve. Li gorî merc û zemîna xwe bi rûxsarî û dengsaziyê cewaz bigre.

Evro li Ewropa, Îran û Hindistanê zimanê ku hatine bikaranîn, hemû endamê malbata zimanê Hind-Ewropayî ne. Di nava zimanê Hind-Ewropayî de, gelek komikên dîtir jî hene. Ji van koman yek; Latîni ye. Ev kom, ji Firensî, Spanyolî, Îtalyanî, Portogâlî û Romanî pêk dihê. Ev hemû binyata xwe ji zimanê Latîni werdigrin. Lê bi gîştî wekî zimanê Romanî dihêne nasîn. Komeke din jî, zimanê Germanane. Ew jî, Almanî, Holandayî, Îngilîzî, Siwêdî, Nêrwêcî, Danî û Îslandî ye. Koma din jî, zimanê Ariyan e; ew jî Farisî, Belocî û Kurmancî ye.

Li dervayî famîla zimanê Hind-Ewropayî wekî dîtir gelek malbatên din jî peyda bûne. Wek li Ewropayê zimanê ku Hungarî, Finî, Laponî û Estonî pê diaxifin, ew malbata zimanê FÎN-UGOR in. Zimanê ku Efrîqa pê diaxife, malbata zimanê BANTU ye. Zimanê Îsraîl, Erep, Aşûrî pê diaxifin, malbata zimanê ARAMÎ ye. Zimanê Tirkî, Azerî, Kazakî, Magolî diaxifin, zimanê URAL-ALTAY î ye.

GUHARTINA ZIMAN

Zimanzan dibêjin; ziman jî weke sirûştê dihê veguhartin û ziman jî, mîna sirûştê xwe diguherîne. Di guhertin û pêşkeftina ziman de, cîh û dem û peywendiya wê li gel xakê, xwedan roleka mezin e. Ziman nola organizmaya sirûştê di nav rêpîvanên xwe de diçe û çavdêriya daxwaziya mirovan nake.

Ji bo mînak;

Em li Bêrtiyên ajalvan û bi zimanê wan yê dervayî bajêrî binêrin; di zimanê wan de û têkiliyên wan de peyv û têgeh pir pêş de ne. Her wisa civakên ku bi deryayîne xwedî zimaneka cuda û cewaz in. Têgeh û peyvên ku peywendiyên wan bi rêk dixê pir pêş de ne.

Her wekî din;, jiyana sosyo-polîtîk xwedî hokarekî serekî ye di pêşkeftina guhartina ziman de. Qonaxa ku babeta ziman pir pêş de ye, ew qonaxên azad, serbixwe û bê fişar in. Qonaxa ku zimanê kurdî pir xurt bûye, serdemê danana mîrneşîniyên kurdane. Hozan û zanyarên kurd jî di serdemêke wiha de derketine.

Di guhartina ziman de, karîgeriya netewa desthelat pir mezin e. Mînaka vê ya herî ber bi çav jî zimanê kurdî ye. Welatê kurdan heta niha di bin gelek kolonyalî û dagirkeriyên de ma û hebûna xwe berdewam kir. Ev tişt di heman demê de dagir û karîgeriya ziman jî bi xwe re anî. Di encama vê rastiyê de, evro di nav zimanê kurdî de gelek peyv û dengên bêgane hene.

Mînak;

Şûna ku bibêje dergeh bigre yan jî dade, qapî qapemişke.

Şûna Elî hat?, Alî mî hat?.

Yan jî şûna heger hebe, hebese û htd.

Bi karîgeriya zimanê biyanî ve zimanê resen dikare bilewte û dejenere bibe.

Li ser ziman bandora hêz û komên biyanî pir mezin e. Dema em evro nimuneyên vê rastiyê dinêrin; gelek zimanê civakan di bin fişara netewa serdest de heliyaye û ziman hatiye jibîrkirin. Di nava civaka kurd de jî

gelek kom û eşîretên hatine bûhujandin, zimanê xwe jî bîr kirine, yan jî, ji bo xwe zarekî tênegehiştî dirust kiriye.

Her wekî din, di guhartina ziman de, rola zimanê zarokan jî heye. zarok tiştê ku ji dê û bavê xwe fêr dibin, li gor xwe dengê xwe bi lêv dike û dihîne ziman. Ev deng û peyvên ku zarok diguherîne pişt re dibe binyata guhartina ziman.

Her wisa mirovên genc û kal û pîr jî di heman zimanî de, heman peyvên bi kar nahînin. Di heman komê û malbatê de ne, lê devokên ku bi kar dihînin ne weke hev e. Ev rastî di nav civaka kurd de pir bi balkêşî xuya dibe.

Piraniya zarokan tîpa (R) bi hêsanî nikarin bi lêv bikin. Şûna ku bibêjin Rovî, dibêjin lovî an jî lowî.

Li herêma Serhedê hindêk dever şûna tîpa (B), (V) yan jî (W) bikartînin. Mînak; xebat - xewat, dibe - diwe, xeber bide - xever bide htd.

Li Amed ê hindêk navçe şûna tîpa (J) yê (Z) yê bikartînin. (Ez jî), (Ezî) hindêk dever hene şûna ku bibêje diya min dibêje ciya min.

Li Çolemergê jî hindêk dever tîpa (W) yê nikare bi lêv bike, tîpa (R) yê bikar nînin, di hindêk peyvên de pîta (B) dibe (P). Şûna (were) dibêje (vere), şûna (Kuro)-(Kuo)-şûna (bavêje) (Pavêje) di bikaranîna ziman de, bilêvkirina tewş û şaş, guhartina ziman de xwedî hêz e û dihêle ku ziman, hal û rewşeka din werbigre. Guhartina ziman, bilêvkirina kêma û tewş ve dest pê dike. Pişt re dema ku dihê pesendkirin û bikaranînê di ziman regekî din distîne û ji halê xwe yê berê cewaztir dibe.

Mînak;

Hindek dever dibêjin (nikare) hindek cîh jî dibêjin (nikane) ev her dû peyv jî di heman wateyê de dihê bikaranîn û hatiye pesendkirin jî. Her wisa (payîz), (payizd) – (Ka), (ca) – (xwezî), (xwezila)- (wisa, wilo, werganî, welê, weha, wiha) û hwd. Gelek dever hene hindek peyvên hevbeş bikartînin, lê wateyê wan cûdane.

Minak;

Peyva “guman” ev peyv di wateya giştî de şûphe ye. Lê li herêma Serhedê di wateya hêviyê de dihê bikaranîn.

Peyva “poz” li hindek deveran di wateya bêvil de dihê bikaranîn. Lê li devera Behdînan bi wateya endema zayendayî dihê bikaranîn.

Peyva “Xir” li devera Behdînan di wateya giştî yan jî hemû de dihê bikarhînan, lê li deverên bakur ev peyv di wateyekî din de dihê bikarhînan yanê endamê zayendê ye zîlam. Bi vî awayî gelek peyvên hevbeş hene.

Di vê wateyê de dema mirov li van nimûneyan dinêre, hokarên guhartina ziman dinêre, ji rewşa zimanê kurdî têdighê. Ji ber vê çendê jî zimanê kurdî bi parçe û formên cewaz de dimîne.

Gelê kurd ji desthelatîyeka navendî dûr e, ji jiyaneke sosyalî û polîtîkî lawaz e. Ev xal dibin egerên serekî di guhartina ziman de û her yek dibe hokaraka giring li pêş zimaneka hevbeş. Ev arîşeya henê, bi xebateka xurt ve dê bihête çareserkin. Ev ziman, ji bo hebûna gelê kurd nîrx û hêza herî bi rûmet e.

Her kurd, di vê xebatê de berpirsiyare da xwe bi vî zimanê pênase bike, divê merc û şiyânên wê jî biafirîne.

Her takekesê kurd, têkiliyên xwe yê jiyânê bi zimanê dayîkê ve bi rêk bixîne, eve dê bibe mezintirîn yadîgarî ji bo dayîkan. Heta niha li dijî hemû fişar û azaran, yê ku ziman parazt û lê xwedî bû, dayîkên kurd bûn. Ew dayîka ku ziman daye me, divê serbilind û serfiraz be. Gava dayik bihête guhartin û bûhujtin, wê demê ziman û civak jî dihête guhartin û bûhujandin.

Evro xwendekarên zankoyan, bersivekin ji bo hêviyên dayîkan. Evro ew xwedî xîretekê bi rûmetin li hember bûhujandin û jinavçûnê.

Ziman nasnameya civakê ye. Ziman kesayete û samana mirovatîyê ye.

pexşana ZIMAN

Mirov, berî ku bibe mirov, di pir qonax û pêvajoyan de derbas bû, ta ku xwe gihande emrazê axafitînê ku em ji wê emrazê re dibêjin ziman. Ev qonaxe, pêşketin û guherînên civakî yê hemeçûnê werdigre nav xwe. Her wiha di derbarê ziman de jî pêşketinên zor giring rû dan. Bi kurtî em dikarin wiha bibêjin: Mirov, piştî berhevanîna siruştî tuwanekariyek, serborek, hêzek wergirt. Di encama berhemdariya siruştî de, zimanek peyda kir. Ziman, ji bo danûsitandina civakê ya pêwist bû. Mirovê ku li xwe digeriya, di dawiyê de gihiştê vê rewşa nû. Ango, serdemek hebû civak bê zar û ziman weke ajelan dijîyan,

wek ajelan kerî bi kerî, an jî bir birî digeriyan. Ev xal, destnîşana mirovbûyîne ye. Di mirovbûna mirovan de ziman giringtirîn hokar û taybetmendiye. Bi peydabûna ziman ve, êdî ew fêrbûnên ku hatine bi destveanîn, bi awayekî hêsanî diherike nav jiyana nişên ayindeyê. Êdî pîremêr û pîrejinên civakê serbor, zanîn û têgehîştinî xwe, bi riya ziman ve didin zarok, nevî û neviçirkên xwe. Ev babate di berdewamiya jiyane de bû egerên çand û hunerê. Nirx û dab û nêrtên civakê ji hev cuda bûn. Jiyana ku ji ajelan ne cewaztir bû êdî werdigeriya ser jiyaneke xwedan sîstem, yasa û rêwişt. Ev yasayên nû civak kategorîze kir, werara wê kir û ber bi gelbûyîne ve bir.

Wek hatiye diyarkirin, li cîhanê qasî sê hezar zimanên biçuk û mezin, mirî û jiyayî heye. Di nava van zimanan de, her yek li gorî cografya û mercên xwe reng wergirtiye û pêşkeftiye. Taybetmendiya di navbera van zimanan de yek jî ewe ku; her tişt, li gor zayendeya civakê dihête bilêvkin. “Nêr û mê” bûna zimanan ji bo lêkolîneke civakên ber bi nebûnê ve diçin û ji aliyê serdestan ve dihête haşa û mendelkin belge û peyteke zor giringe. Ji bo vê çendê, ew zimanê ku bêhtir peyv û dengên “mê” ya bi karigerin, amajeyî serdema dayîksalariyê dikan. Ango ew zimane ya zor dêrîne, dirêj dibe heta destpêka mirovatîyê û di dema dayîksalariyê de berceste bûye. Bêhtir peyv û gotinên “mê” ve dagirtiye. Piştî ev rêkxirawa civakê, rêveberiya xwe diguherîne, desthilatdarî derbazî destê mêr dibe. Bi bavîksalariyê ve peyv û gotinên “nêr” zimanê civakan jî diguherîne. Hindek

ziman jî hene bi tenê “nêr” in. Ev berejenga vê yekê ye, ev civaka ku xwedî zimaneke “nêr” e, dema dayîksalariyê nejiyaye û nedîtiye.

Gelek sedem hene di derkeftin û peydabûna ziman de. Berî jiyana niştecihiyê, di navbera mirovên qebîle û eşîrê de, zimanên hevbeş û wekhev hebûn. Ev mirovên ku zimaneke hevbeş diaxifîn, ji ber koçberî û koçeriyê, zimanê wan ji hev dûr ket û şewazên cewaz wergirtin. Bi vî awayî di dengê peyv û bêjeyan de guhertinên nû çêdibin, pêşdikevin. Hindek peyv ji nav ziman dihête avêtin û derxistin. Ango, jiyana dibe egera peydakirina peyvên nû. Her wekî din, di morfolojiya hevok û risteyan de jî guhertin hene. Ew civaka ku koç kiriye û çûye cem xaka civakeke dîtir, ev her dû civak di aliyê ziman de ji hev gelek tiştan werdigrin û didin. Di destpêkê de guhertinên ku dibûn, bi tenê karigeriyeke pir biçuk li ser zimanê zikmakî dikir. Lê, her koçerî pêşket, di deng, peyv û gramera ziman de jî guhertinên pir mezin rû dan. Weke dihête zanîn, spanyolî, fransî, portogâlî ji latînî, engilîzî, norveçî, swedî, danî, hollandî jî, ji zimanên almanî ya kevin peyda bûne. Her wisa, li dûv zimanzanên kurd jî, zaraveyên kurdî, farisî jî, ji zaraveya kurdî ya dimilî peyda bûne. Lê evroke, her yek bûye zimaneke serbixwe û cewaz

Ziman hemîşe dihête guhertin. Tiştê herî giring ewe ku; mirov wê li gorî merc û rewşa qonaxa xwe bi rêk û pêk bîne. Bi bûyerên civakî ve peyvên cûda cûda jî, xwe nîşan didin û xwe dixin nav ferhengoka me.

Piştî serdema teknolojiyê ve peyvên nû û bikaranîna peyvan de şêwaz û bangên nû peyda bûn. Weke kozmonot, lazer, setalayt, faks, telefon, htd. Hindek gotin û peyvên navnetewî çûne nav hemû zimanên cîhanê. Ji layekî din ve, hindek berejeng û pîtên destpêkê ve jî hindek tişt hatine pênamekirin. Ji bo nimune: \$, %, @, &, UNICEF, UN, USA, NATO, TNT, TV û htd.

JÎN Û ZIMAN

Jin di guhertin û pêşxistina nîrxen civakî û netewî de faktorê serekî ye. Ji destpêka dîrokê heta evroke em vê gorankariyê dibînin. Em dibêjin destpêka dîrokê û berî wê. Ji ber ku dîrok: bi bindestiya jin ê ve dest pê dike, jin dihê guhertin. Çîn û tex di nava civakê de peyda dibe û jin rola xwe ya pêşengiyê didorîne, dibe alavê destê civakê. Ev çende jî reseniya jinê kêr dike. Loma jî pêwîste ev rastiya jiyana xwe bibîne. Jin pêşenge, eve di sirûştê jinê de heye. Di nava hemu mirovatiyê de jin; bi vê hêza xwe ya giring derketiye pêş. Heman tişt di cîhana ajelan de jî heye. di nav keriyek pez de, her tim yê ji keriyê re pêşengiyê dike bizine. Ask jî wisan in, pelawer wisan in. Pir balkêşe, civaka me bêhtir ajelên mê xwedî dike û jê hez dike. Ji ber ku ji nêr bêhtir, mifayê ji ya mê werdigire.

Pir seyre, peyva jin û jîn yan jî, jin û jiyana pir nêzîkê hev in. Her wekî din peyva mêr û mir yan jî, mêr û mirin di zimanê kurdî de jî heman jêderê peyda dibin. Di vê mijarê de karê yekem ewe ku, rola jinê çiyê di pêşxistina zimên de û çî jê dihê xwestin; em li ser van xalan rawestin.

Di ziman de giringiya erka jinê bê gengeşe ye. Di fêrbûn û pêşxistina zimanê gel û netewî de jin xwendengeha seretayî ye. Her zarokê ku dihê dinê, destpêkê bi zimanê dayikê diaxife. Em ji vê re dibêjin zimanê zikmakî.

Zimanê kurdî bi giranî zayendeyeke mê ye. gava mirov li ser vê mijara ciwan radiweste, li rastî pir tiştên matmayî û balkêş dihê. Ji bo çî di zimanê kurmançiyê de hinde elementên mê ya zêdeye?

Ev ziman bingehe xwe ji rojgariya dayiksalariyê werdigire. Yanê zimanê kurdî serdema desthilatdariya jinê dîtiye, yan jî peyda bûye pêş ketiye. Loma jî peyv bi giranî mê ne. Ji peyvekî dikare peyvekî din lêk bide. Ji hev dizên û dikeve rewşeke din. Ji bo nimune em li peyva gerîn binêrin:

“Gerîn”; ve-ger, lê-ger, wer-ger, ber-ger, ger-gerok, ger-inde

Yan jî peyva “girtin” ê binêrin:

Girtin ; hil-girtin, ve-girtin, ra-girtin, wer-girtin

Em dikarin bi vî awayî bêhtir mînakên bidin. Bawermendiya civaka kurd jî, li ser vê şengisteyê rû daye. Peyva xwedê û yadê, pir nêzîkê hev in û peyveke mê ye. xwe-dê yan jî xwe-da. Dema mirov vedikolîne encama derdikeve pêş eve, yanê ji xwe dayîn, bi xwe dayînê peyda bûye. Peyva “da-yê” yan jî “ya-dê” jî xwedî naverokeke wiha ye. peyva “xweza” jî nimuneyeke giring e, ji xwe û zayinê lêkdide. Hingê em dikarin wiha bibêjin; berî xwedê biçe jor li erdê bû û ne hêzeke abstrakt bû. Berûvajiyê wê berbiçav bû û mirov bi xwe bû. Ji mirovan jî ya jin bû.

Pir ziman yan jî gel hene, pêşketina civakê nejiyane. Lê, kurd ne wisaye. Di nav hemû pêvajoyên civakî de derbas bûne û xwedî şaristaniyek dewlemende. Vê karaktera xwe jî, ji afirandêriya jin ê werdigire. Ji ber vê yekê em dikarin bi asanî vê bibêjin; zimanê kurdî berhemê jinê ye. Jina kurd ew afirand, pêşxist û xurt kir. Lê evro ketiye nava metirsiya hebûn û nebûnê.

Armanca me ew e ku, da bikaribin zimanê kurdî û rewşa wê ya evroke çareser bikin, divê em navê jina kurd jî di nava vê xebatê de bibînin.

Li vê derê em dikarin pirsêkî wiha ji xwe bikin: gelo zimanê kurdî pir pêşketî û xurt bû, li gel hewqas çewsandin û qedexeyan, dîsa jî hebûna xwe domand û parast? Gelo mirovê kurd pir welathez bû li çand û zimanê xwe xwedî derket, nehêla têk biçe? Yan gelê kurd li hember kolonyalîstiyê û zordestiyê li ber xwe da ji ber vê yekê jî ziman û çanda wê hebûna xwe berdewam kir?

Naxêr, mixabin, di vê qonaxê de ne zimanê kurd hewqas pêşketibû, ne jî mirovên kurd. Di parastin û berdewamiya zimanê kurdî de, egera serekî jina kurd bû. Evroke civaka kurd di hebûna vî zimanê ku her çend kême jî- heye, deyndarê jina kurde. Belê jina kurd bi objektîfî, bû parastvanê zimanê kurdî. Jina kurd nexwendewar û nezanbû û biyaniyê jiyana dervayî malê bû. Jina kurd dernediket nava civakê, di nava malê de bi zarok û karê malê re mijûl dibû. Ev peywendiya civakî jina kurd di nava çarçoveyek teng de dihêla. Peywendiya wê li gel cihana derve nebû. Bûhujandina (asîmîlasyon) li ser civaka

kurd digeriya kar li ser jina kurd nedikir. Asîmîlasyona sîstema dagêrker heta ber dîwarê hewşa malê dihat, lê diket û vedigeriya. Jin ji vê asîmîlasyonê îzole dibû. Bi sirûştî zarokên xwe re bi zîmanê xwe diaxîfî û gor dab û nêrîtên kurdewarî dida û disitand. Jina kurd rêk nedida asîmîlasyona sîstema kolonyalîst. Ji ber vê yekê asîmîlasyona sîstemê û polîtîkayên wî dihatê pûçkirin, betalkirin. Gava dagêrkerî bi vê çendê hesiya, bi lez û bez kete nava bizav û hewildanan. Yekser li her gund, navçê û bajêrên Kurdîstanê dest bi xebateke nû kir. Ji bo vê jî digot; em dixwazin jigelê xwe re xîzmeteke mezin bikin û wan şiyar bikin. Pir baş dihê bîra me kurdên 12 rezberê dîtine û dizanin. Sîstemê helmeteka xwendinê da destpêkirin. Bi navê xwendengehên şevê (Gece okullari) xwendengehên elî (Alî okullari) ve jinên kurd, ji yê bist salî bigire heta jinên heştê salî bir wan xwendengehan û bi vê polîtîkayê ve astengiya li pêşiya asîmîlasyona xwe ya herî mezin rakir.

Piştî keçên kurd ketin nava vê babelîskê, di jiyana kurdan de rûpelek nû vedibû. Zarokên dê û bavan, ji dayikên xwe şerm kirin û ji bavê xwe reviyên. Ji bo bibe aktivist ji malê reviyên. Kete nava tariyeke bêbinî. Di hêlekî de rêya metropolên tirk ji keçan re vedikir, di hêla din de jî bi navê ayîn û îslamiyetê ve bang dikir malbatan ji bona zarokên xwe xwedî bibin. Ev rewşa paradoks civak dixiste nava dubendiya û dudiliyan.

Keçên kurd bi xwendengeh û xwendina tirkan ve ew dergehê ku ji asîmîlasyona tirkan re girtibû, bi destê xwe vekir.

Ev car asîmîlasyon werdigiriya oto-asîmîlasyonê. Êdî sîstem bi darê zorê yan jî polîtîkayên ditir ve kurdan nahelîne. Ji ber ku wî jî dît; kurd bi xwe, xwe didin helandin û didin bûhujandin. Ev jî bi rêka jina kurd ve çêbû, ji ber ku jina kurd kete nava perwerdeya sîstemê û bi vî awayî sîstem jî gihişte armanca xwe.

Belê, em li vê derê pirseke wiha dikarin bikin: gelo jina kurd bi xwendinê ve şaşitî û çewtiyek kir!?...

Naxêr, berûwajiyê wê, bi xwendinê ve tişteke pir giring û pêwîst pêk aniye. Mebesta me ne ewe. Bila jina kurd bêhtir bixwînin. Lê li ser puxte û naveroka xwe. Ji vê saman û renginiya kurd dûr nekeve û nebe biyaniyek. Pêşketina jinê pêşketina hemû kurdane. Di heman demî de biyanibûna jinê, biyanibûna hemû civakê ye.

Evro em lê dinêrin gelek keçên kurd zimanê xwe nizanin. Ji Mêrdînê ye, ji Wanê ye, ji Amedê ye, dibêje: ez kurdî nizanim! Ev karesateke mezin e. Heger jin ketibe vê rewşê, divê bi demûdest xwe ji vê

kambaxiyê rizgar bike.

Bi taybetî piştî valakirina gundan di jiyana kurdan de kozmapolîtîzmek hate der. Di nava bajêrên mezin de ev gundiyan biçuk wenda bûn. Xweziya xwe bi neyarê xwe anî û lasayî dijminê xwe kir. Bû evîndarê kujekê xwe. Di vê derbarê de rewîsta jinê dihê guhertin. Jina kurd xwedî berhem û nîrxê herî mezin ya zimanê kurdî ye. Evro jina kurd di her alî de xwe rêk û pêk dike. Pêwîste di warê çand û zimanê kurdî de jî pêşrewaniyê bike.

Mixabin em di vê xebatê de navê jina kurd nabînin. Xebata zimanê kurdî, xebata jina kurd e. Lê jina kurd di vê biyavê de lawaze. Di vê mijarê de kar û barên wan pir giring e. Heger jin li zimanê xwe xwedî dernekeve, têkçûn û wendabûna wê pir nêzîke. Bi taybet jî jina ku peywendiya wê li gel polîtîkayê heye, divê zimanê zikmakî ji xwe re bike karê serekî.

Jina asîmîle bûye, ji bo civakê înzekirina kaxiza mirinê ye. Pêwîste jina kurd li hember vê dejenerasyonê xwe bibîne, xwe nas bike.

